RIKOSUHRIPÄIVYSTYS
VICTIM SUPPORT FINLAND

# Komeleya Piştgiriya Qurbaniyên Fînlandiyayê (RIKU)

Ew rêberî û piştgirî dide qurbaniyên sûc, xizmên wan û şahidên sûc.

BI ŞÊWEYEKÎ SERHÊL

BI RÊYA TELEFONÊ

BI AWAYEKÎ RÛ BI RÛ

**RIKU ji bo qurbaniyên bazirganiya bi mirovan an jî keysbaziya bi vî rengî xizmetên taybet pêşkêş dike**

**Bi me re têkiliyê bike eger:**

- Hûn hatine xapandin û ketine rewşekê ku hûn nikarin bêyî ku bikevin tengasiyê jê derkevin.
- Kesek we îstismar dike, bo nimûne, pir kêm pere dide te, we neçar dike an jî we dixapîne ku tu xizmetên cinsî radest bikin, sûcekî bikin, an tiştekî li dijî îradeya xwe bikin.
- Kesek kontrol dike ka hûn çi bikin, hûn biçin kuderê, tu bi kê re diaxivî, an jî tu çawa pereyên xwe xerc dikî.
- Kesek hewl dide ku bi rêya zext an gefan we neçar bike ku hûn guh bidin fermanan, wek mînak gefxwarina eşkerekirina agahiyên kesane, dersînorkirina we, rapor dayîna we ji rayedaran re, an jî zirardayîna we an endamên malbatê.
- Kesek pere daye te ku tu, bo nimûne, ji bo karekî an vîzeyê werî Fînlandiyayê.
- Hûn bi rêkûpêk ji 8 saetan zêdetir di rojê de an jî di saetên dereng de dixebitin bêyî ku mûçeya zêde werbigirin; Bi navincî, hûn di hefteyê de kêmtir ji du rojan betlaneyê digirin, an jî hûn betlaneya nexweşiyê ya bi meaş û betlaneya salane ya bi meaş ji dest didin.
- Tu ditirsî ku heke tu dev ji zewaca xwe an têkiliya xwe berdî kesek dê te biêşîne, an jî ku tu bi zorê ketibî têkiliyekê.

Heger yek ji van ji bo we an kesekî nêzîkî we derbas dibe, an jî hûn guman dikin ku hûn dibe ku qurbanê bazirganiya mirovan an îstismara bi vî rengî bin, ji kerema xwe bi rêya telefon an peyamekê bi me re têkilî daynin:

**+358 40 632 9293**

an jî emailê bişînin **help@riku.fi**

**Ji bo şîret û piştgiriyê bi “Komeleya Piştgiriya Qurbaniyên Fînlandiyayê (RIKU)” re têkiliyê dayne, eger:**

- Tu qurbaniya sûcekî yî yan jî guman dikî ku tu qurbaniya sûcekî yî.
- Tu bûye bînerê (şahid) sûcekî.
- Kesekî nêzîkî te bûye qurbaniyê sûcekî.

Heta tu dikarî bi awayekî nepenî (razî) bi me re têkiliyê daynî dema ku te hîn jî biryar nedabî ka tu sûc ragihînî yan na. Em dikarin agahdariyên pêwîst der barê pêvajoya ragihandina sûc de, bidin te û eger tu bixwazî em ji te re bibin alîkar ku tu giliyekî li dijî sûc pêşkêş bikî.

**Ji kerema xwe agahdar be:**

- Em bêyî destûra te tu agahiyên li ser te yan doza te bi kesî din re parve nakin.
- Dema ku tu bi me re têkiliyê datînî, ne pêwîst e ku tu hûrgiliyên rast ên doza xwe bidî.
- Eger tu bi fînî, swêdî yan ingilîzî nizanî, em her gav wergêrên pispor û pêbawer bi kar tînin.

BI ŞÊWEYEKÎ SERHÊL

➜ **Riku.fi/trafficking**

➜ **Riku.fi/labor-exploitation**

Ji bo şîret û piştgiriya nepenî, eger tu guman dikî ku li cihê karê te bazirganî bi mirovan an keysbazî hene, ji kerema xwe re emailê bişîne **help@riku.fi**.

BI RÊYA TELEFONÊ

**Hêla alîkariya lezgîn ji bo qurbaniyên bazirganiya bi mirovan û keysbaziya bi vî rengî**
**+358 40 632 9293**

Duşem heta înê, ji saet 1ê nîvro heta 4ê êvarî bi dema Fînlandiyayê.
Tu dikarî telefon bikî yan jî nivîsê bişînî.

BI AWAYEKÎ RÛ BI RÛ

Eger pêwîst be, em dikarin li yek ji ofîsên RIKU bi we re hevdîtin bikin.

Eger gengaz be, em ê kesekî perwerdekirî bişînin ku wek kesekî piştgiriyê bi we re were qereqola polîsan an dadgehê.

**Herwiha tu dikarî bi zimanê xwe bi me re têkiliyê daynî.**

RIKU rêxistineke nehikûmî (NGO) ye ku tu girêdaneke wê ya siyasî yan olî tune ye.